

Li NRW-ê ji bo kesên li mafê penaberiyê digerin û kesên xwedî Duldung bidestxistina mafê perwerdeya pîşeyî

Bidestxistina mafê perwerdeya pîşeyî bo kesên li mafê penaberiyê digerin û kesên xwediyê Duldungê(kesê misamehe lê tê kirin) ne, bi van mercan ve girêdayî ye:

- **Bi statûya îqameta we**
- **Bi welatê hûn jê tîn**
- **Bi moleta îqameta we ya li Almanyayê**

Herweha bi vê yekê ve girêdayî ye, bê ka pîşeya tê xwestin li xwendingehê/Medrese/ (Weke mînak: perwerdekar, xizmeta ji bo pîr û kalan, Fیزیoterapist) an li kargehekê pêk tê.

Ji bo **perwerdeya pîşeyî ya li xwendingehê** (ji bilî beşên pratîk) **destûra Daireya Biyanîyan(ABH)** ne pêwîst e. Eger qedexeya kar tune be, kesên li mafê penaberiyê digerin û kesên xwediyê Duldungê ne, dikarin **ji roja yekê** ya îqameya xwe dest bi perwerdeyê bikin.

Ji bo **perwerdeya li kargehekê** herdem **destûra ABH-ê** pêwîst e. Divê ev destûr ji aliyê ABH-ê li ser îqametnameya we bê nivîsandin. Eger pîşeyê ji pîşeyên ji aliyê dewletê bi fermî hatibe naskirin, an jî di statûya wan de be, ne hewce ye weke kar, Ajansa Kar ya Federal (Bundesagentur für Arbeit) jê were agahdarkirin. Lewma **kontrola pêşaniyê jî çênabe. Li aliyê dinê bo destpêka perwerdeya pîşeyî li kargehekê ev divên:**

Bo kesên li mafê penaberiyê digerin

Ku qedexeya kar tune be, kesên li mafê penaberiyê digerin (Kesên xwedî Îqamet an jî îsbata hatinê-**Aufenthaltsgestattung, BüMA,Ankunftsnachweis** bi wan re hene) piştî îqameta **bi sê mehan** li Almanyayê dikarin dest bi perwerdeyê li kargehan bikin. Lê eger hûn bo Şaredariyekê(Kommune) hatibin şandin. Mimkin e ku heta şandina we **heta şeş mehan** bajo.

Bo kesên bi Duldungê

Eger bo wan qedexeya kar tune be, kesên bi Duldungê dikarin **yekser** dest bi perwerdeya kargehî bikin.

⇒ Biryara misoger, bê gelo destûra kar bo perwerdeya pîşeyî dê bête dayin, ya ABH-ê ye.

BALDARÎ QEDEXEYA KAR

Dibe ku bo kesên li mafê penaberiyê digerin û kesên bi Duldungê, qedexeyêke misoger ji bo kar hebe ku pê **perwerdeya kargehî ne mimkin** be. Ev yek ji bo kesên li mafê penaberiyê digerin bi § 61-ê ya qanûna penaberiyê û bo kesên bi Duldungê bi § 60-î xala 6 ya qanûna îqameyê hatiye birêkûpêkkirin.

Li gorî qanûnê li jor destnîşankirî, **ji bo kesên li mafê penaberiyê digerin û kesên bi Duldungê**, kar qedexe ye, ku ew ji **“dewleteke ewle”** hatibin û piştî **31.08.2015an** serî li mafê penaberiyê dabîn.

⇒ A bo qedexeya kar diyarker e dema qeyda pêşî ye. Ango roj, meh û sala li ser BüMA-yê ye. **Ev qedexe bo kesên BüMA-ya wan beriya 31.08.2015 hatiye amadekirin, derbas nabe.**

⇒ Rênişandaneke: Bi saya kopîkirina BüMA-yê dikare herdem qeyda pêşî bê îsbatkirin.

⇒ Li gorî qanûnê qedexeya kar bo penaberên serlêdana xwe piştî 31.08.2015an kiribin, bo kesên bi Duldungê ku serlêdana xwe piştî 31.08.2015an kiribin û serlêdana wan hatibe redkirin. **Kesên ji sedemên dinê bi Duldung in (bêyî serlêdana mafê penaberiyê) nakevin ber vê qanûnê.**

Dibe bo **Kesên bi Duldungê**, li gorî §60-î ya qanûna îqametê ji van sedemên li jêr jî kar bê qedexekirin:

- Eger hûn jo bo alîkariya sosyal hatibin Almanyayê
- Eger hûn jiber sedemên ku hûn berpîrsê wan in, neyên dersînorkirin.

⇒ Li gorî qanûnê kesên bi Duldungê, di rewşa derheqê nasnameya xwe de agahiyên şaş dabîn, an jî bo bidestxistina belgeyên nasnameya wan piştrast dikin, hewl nedin, bo nedersînorkirina xwe berpîrs in.

⇒ Herweha karmendên ABH-yê jî şaşiyên dikin. Jiber vê yekê divê herdem bê kontrolkirin, bê bi rastî jî sedemên bo qedexeya kar hene, an na.

Bi KURTAYÎ DEWLETÊN EWLE

Konsepta ‘dewletên ewle’ dikeve ber qenaeta qanûnî ku li hin welatan ne şopandin, ne cezayên nemirovahî û rûmetşikandinê û ne jî miameleyên weha li wan diqewimin.

Kîjan welat weke ‘dewletên ewle’ tîn binavkirin di **pêveka li ya § 29a ya qanûna penaberiyê** de heye. Niha ev welat in: Albanya, Bosna - Hersek, Gana, Kosovo, Makedonya, Montenegro, Senegal, û Sirbîstan.

Konseya Penaberan ya NRW-ê(Der Flüchtlingsrat NRW), jiber ku mafê penaberiyê bisînor dike û gelekê çaran destnîşankirina hin welatan weke ‘welatê ewle’ bi keyfiyeta siyasî dibe, konsepta ‘dewletên ewle’ rexne dike.

Kurmandschi

(Zugang zu Berufsausbildung
für Asylsuchende und
Geduldete in NRW)



Têkilî

Di dema perwerdeyê de mafê Duldungê

Ji 6.ê Tebaxa 2016an û vir ve, bo kesê perwerdya pîşeyeke ji aliyê dewletê ve naskirî an jî di statûya wê de, mafê Duldungê heye. Duldung ji **bo hemû dema perwerdeyê** tê dayin û piştî bidawîananîneke serkevtî jî **şêş meh bo dîtina karekî**, tê dirêjkirin. Ev ji bo kesê/kesa tê perwerdekirin rêgezê nû ye ku îqameta wî/wê ji **bo temamê dema perwerdeyê** tê misorgerkirin.

Ku perwerde bê birrîn, divê ew kes di nava şêş mehan de ji xwe re cîhekî din ê perwerdê bibîne. **Kesê/kesa tê perwerdekirin, divê di rewşa devjêberdana perwerdeyê de, di nava hefteyekê de ABH-ê ji rewşê agahdar bike.** Ku neke divê ew heta 30.000 Euroyî ceza bide.(Bingeha qanûnî: §60a paragraf 2 hevok5 ya qanûna îqametê).

Lisa Walter

alpha OWL II
Flüchtlingsrat NRW e.V.
Wittener Straße 201
D- 44803 Bochum

Tel.: +49 (0) 234 - 587315 - 80
Fax: +49 (0) 234 - 587315 - 75

Telefonsprechzeiten: Mo-Do, 10-16 Uhr
E-Mail: alphaOWL@fmrnw.de
www.fmrnw.de/alpha-owl/

Das Projekt alpha OWL II wird im Rahmen der ESF Integrationsrichtlinie Bund im Handlungsschwerpunkt „Integration von Asylbewerber/ -innen und Flüchtlingen (IvAF)“ durch das Bundesministerium für Arbeit und Soziales und den Europäischen Sozialfonds gefördert.



AGAHIYÊN DINÊ: Hûn dikarin agahiyyên derbarê bazara kar bo penaberan ji vê Linkê peyda bikin:
www.fmrnw.de/alpha-owl/hintergrundinfos

FlüchtlingsRAT NRW e.V.

Bidestxistina mafê perwerdya pîşeyî

(Çiriya Paşîn 2016)

Herausgeber: Flüchtlingsrat NRW e.V. im Rahmen des Projektes alpha OWL II